

WRITER CULTURAL MAGAZINE

گوفاره‌کا نیف هه‌یقی ئەده‌بی و روشەنبیری یه، خودان موله‌تا فه‌رمی یه
Kovareke Nîv Mehî ye A çand û Rewşenbîrî ye û xwedî muleta fermî ye
مجلة نصف شهرية، أدبية و ثقافية، رسمية و مرخصة



سالا 4 sala
السنة



ئیمتیاز و سه‌رنفیسکار: نه‌زیر چه‌مباهیقی
Îmtiyaz û Sernivîskar: Nazeer chembahivy
الامتیاز و رئیس التحرير: نظیر علی





73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوڤار ب موله ته و فهرمی (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye



سه رگوتارا گوڤاری نقیسن: نه زیر چه مبا هیقی

تاوان یان تاوانباریا بی هیقیبون

بی هیقیبون ئانکو شکهستن به رامبه ره می ئارمانجا و مرنا
 ئومید و هیقیان لدهف مروقی ئانکو خوسه پاندنا ره شبینی و یا
 فه ره هه ردهم ب گه شبین بین و هیقیان ژ دهست نه دهن، ئه قه ژی ل دیف نیڤرین و
 بوچوونین هندهک زانایان وهکی ئارسه ر دهما دیژت: ژیان هه می خاپاندنه و چه ند
 زیده تیدا بژی دی بو ته پتر ئاشکرا بیت و هه ستی که ی دوماهیک هه ر بی هیقیبون و
 نه مانه، ئانکو وهکی زه لامه ک ژیی وی دریژ بیت دناف دوو نه وهیان (سه رده مان)
 دا بژیت وهکی دناف چادرا سپر به ندهکی ژیان بوراندی و هه ر ئیک شانویه به لی ب
 دوو شیوازا یا دیتی، یان دوو هه قالین ئیک ل زارو کینی و پاشان ژ هه ق دوو
 قه قه تیابن هه تا ژیی دانعه مریی دوباره هه ق دوو بینن ئیکسه ر هه ستا زارو کینی دی
 کن و بیره اتن دی ل ئه وان قه گهرن بو ژیا نا به ری چه ندین سالا، دبیت خوزین
 به ری بخوازن بو جوانی و خوشیا سه رده می بوری)،
 دیسان فه یله سوفی چینی دیژت: هه که ته بقیت بی هیقی نه بی بو گوهداریا دهنگی
 ته یرکا چ رکه ها (قه فه سا) نه کړه به لی هندهک دارا ل ده ردورین خو بچینه، هه که
 ته بقیت ژ نه زانینی قورتال بی چه ند ب شول بی بو خو ده لیقه کی په یدا بکه
 بخوینی و هه که نه خوینی ئه و ته خو ئیخست د نه زانینی دا، هه که ته نه قیت
 شکهستن ب سه ر ته دا بهی و هیقیین ته نه ئینه کوشتن نه روینه و نه راوسته خو
 هه که نه شی بله ز بریقه بچی ژی هیدی بریقه هه ره یا گرنگ ئه وه نه راوستی و
 نه روینی و بی هیقی و ئومید نه بی وهکی ئه قی گوتنا عه ره بی (من کثر النوم سبقه
 القوم) ئه قجا بلا نه ل پیشی بی به لی نه مینه ل پاشی، نه بیژه فه له ک خائینه و
 هیقیان نه کوژه و پاشان هیقیین خو تاوانبار بکی و تو بخو ئه گه ری بی هیقیین خو



73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة)



سەد ما شەلا ژ قا مەتێ
گەردەن و سینگ و بەرو مل
وان غەمازو بره و چاقا
پێدقی ناکەن چ رەنگ و کل
سحرا ئاورێ چاقین تە
داگیر کرن تم جەرگ و دل
شەب تا سەحەر نە نقستم
بو دیتنا تە چاق مانە زل
ژ وان پەیف و دەنگی نازک
حیبه تی مان کەو و بلب
ئاگری عەشقی گاف ب گاف
ددلدا هەر ما گەش و هل
وەک زاروکی دیری دایکی
ژ روندکا چاق مانە شل
وەره خەونا من بکە راست
پێکە بژین ئەم مل ب مل
چەند نازداریا بو من بکە
ژ تە نابم توره و سل

هەلبەستقەن

م. محمد بابی نیگاری



73
10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة)



..... بئ ئە گەر چووی هەلبەستقان /م. بە حری قەدشی

دوو بـری قەوسا هیلالی
بە حری ژبو کـور دنالی
تو بوچی بئ ئە گەر چووی
کە تـم دەردی ب وی حالی

هندی من فام ژ دنی کری
من یا حەشتە بتنی کری
تو بوچی بئ ئە گەر چووی
من عەشقا بو مرنی کری

من خو بوته کربو پرەك
ناقبەرا مە نه بو سپرەك
تو بوچی بئ ئە گەر چووی
من ژقینی دا بوته خرەك

وهره دلی من ته نا که
خوشیا جارا تو لی چاککه
تو بوچی بئ ئە گەر چووی
هیلینه کا نوی ئا قا که

قالایه جهلی ته کهس نینه
چەند بوته بیـم هەر بەس نینه
تو بوچی بئ ئە گەر چووی
بیی ته قەد من نه فەس نینه

دویری تـه من نه قیت ژیان
من توبه کـر عەشق و قیان
تو بوچی بئ ئە گەر چووی
باغ و گۆلیستان تـه ف هریان



73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوفار ب موله ته و فهرمی (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye

هه لبه ستقان: م. ریبه رژیباری

په یقین رهق

من تو نه قی وهکی نه قرو
دیرکه قه نه قین ب قه هرو
تو وهکی ده سپیکي نه مای
پیش چا قه هره دل که قرو

نه قرو نه وهک دو هی و پی ری
ما دی دلی من قه هی ری
ئه ز نزانم چ چ بی به
په یقین رهق بی ری و قه دگی ری

ئه گهر ئه زیم یا راست و حهق
خو نا گرم بهر په یقین رهق
په یقین ته نه قرو قه ناس بین
دلی دکه فتن دهق و دهق

زالم من نه زانی یی هوی
هی قیا ئه قی دلی بووی
ئه ز گه له کا په شیمانم
بو وی ژیی دگهل ته چوی.



73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوفار ب موله ته و فهرمی (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye

هه لبه ستقان
م. حه سه ن مزیری

(كه لا غربه تا)

چهر خو فه له ك ليك زقري
بايئ غه ريبيا تو بري
ئه زئ ره به ن هيلام بتئي
كارئ من بو رونكو گري

كه لا غربه تا ئه سمه ريئ
ژ هزرو بيرا ناچته ده ريئ
چومه چه ئ بير هاتنا
چول بيون ئه و خوشيت به ريئ

به سه كه لي لمن ئه ف دله
ديل واريئ خو بزقره
ژ خه مو كو قانا زالم
رؤي ژ روندكا هه ريئ شله

ديئ وه ره جان سه برا دلا
به ژنا زراف تاكي گولا
چاف بله زن بو ديتنا ته
ب شا ديقه بيژه بلا



73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوقار ب موله ته و فهرمی (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye

خه ون و ههقی.....

ل به رپه راقین

جو ورو بارین

که قنه روندکین چاقین ته دا

ئه و روندکین ته لپه ناگه هو

ناوسک وشکه فتین دلی من

دکه له گهرمی و دسه قه می دا

ژکادیا شه و اتا بۆمبه یان

مینا له یان ب سه ردیمی

خوه ده دباراندن

ئه و دیمین ته ژماچین

تۆزا بیابانی رزگار کرین

مینا خوینا برینا ته

سۆرت ردکر ..

خه م وزیمار ژئی دپهشین و

شاکین ژانان

ژپه قین وان ده ستین شه لکی

دهاتنه ده ری

دل که سه ری نه تا قا سپیده هیا

لوان گولالیین کوزری داو

گولالیین ته ماچیکرن

نه ژی سۆرگولین بهاری

ب گولا قاخو

خالین دیمی ته ته رکر

روندکین ته !!

رهنج و که دو خه باتاته

شهف و نیف شهف

کوچ و بهزو شهوات و رهف

دچاندکی پشته جانگوریاندا

مانه ئاسی و

نولا خه ونین خه وه روژکان

دبه ر به روشکین ئازادیی دا

ژبیرکرن و وهک پیتهقی

خه ون و ههقی

روچاف نه بوون..

؟ خورشید توفیق باکوزی
ههلبهستان





هنده دلداری بابی خو؟!
 زاروکی روندکین خو قه مالین
 ب دله کی شکهستی قه
 ههردوو دهستین خو بلندکرن
 گوته من
 چه ند روژ دی بابی خو نابینم
 من گوتهی ئه ی کوری باش
 شانازی ب بابی خو بکه
 ئه و قاره مانه قاره مان
 ل سهر دهستی بابی ته
 کوردستان پاراستیه ژ دوژمنی
 ئه و چوو دا ئه م ئازاد بین
 بابی ته دلسوزه
 دیسا دی قه گهریته قه
 زاروک رابوو سهر پیا
 بدهنگه کی بلند کره قیری
 ب وی قیری قه
 بهره ف دایکا خو قه چوو
 دادی دادی
 بابی من قاره مانه قاره مان

.....بابی من قاره مانه.....
 سپیده بوو ده رکه فتم ژ مال
 دا ب ری که قم بو قوتا بخانی
 دهنگی قیری که هات
 زقریم ل قیری
 دبینم پیشمه رگه یه کی
 یی ب سهر و بهر و لیکدای
 کاری خویی کری
 دیاره دی چیته ئه رکی
 ب ماچه کی خوا تر خواست
 ژ کوری خویی ساقا
 دهست بره چانتی خو
 ل که مه ری چه ک گرته دهست
 چوو بهره ف سهری کولانی
 ل گه ل هه قالان ب ری که فت
 زاروکی ساقا دکه ته قیری
 من بهرده دادی من بهرده
 پشتی بابی وی دیار نه مای
 دایکا وی ئه و بهردا
 ده ما بابی خو نه دیتی
 ل نیقه کا کولانی روینشت
 ب چاقین تژی روندک
 دکه ته قیری و هه وار
 باب باب باب
 نزیک بووم ل زاروکی
 ئه ی کوری باش
 ته که سه ک دیتی و هه کی خو

؟ ئیمان نه زیر ده مهزان
 هه ب له ستان



73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوقار ب موله ته و فهرمی (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye



ههبلهستان
7. تاجح بيجانی

عه شق
، دپاییزه کا درهنگ و سه رمایى دا ل ته دگه پيام
، قه گهرينم داهيقيين وى عه شقا به رزه بووى
، پييتى دا ته بيينم دناڤ به لگين وهرياي و زهر
، نهو عه شقا نه ز پى سه رخوش مه ست بووم
، هه مبيژ بكم

، كو مقه بكم جاره كا دى يارزينكين هيقين خو يين ته
، بير بينم بيرهاتنين وان روژيين مه پي كفه بوراندن
، وه ره نه ز بو ته نه قينداره كى
، ته دميينم بى ژقانم ل به ندا
، هه رو سپيدى بهرى روژه لاتنى
، سوژا خو دوباره بكم كو جاره كا دى
، نه ز ژ بو ته و تو ژ بو من

، داکو وان هيقين چه ندين سالان بجهبينم
، تو ژ بو من سيناهييا نه وان چاقانى
، يين كو هيشتا روژه كى بى روڤنك نه ماين
، دناقبه را من و ته دا

، وژقان نينن چ ييزان
، ب دلسوزى ژمن را بيژه ، چ دخوازى
، نه ز ژ بو ته و تو ژ بو من
، يين ته قليهه قبوون لهوما هيقين مه
، هيقين دو عاشقا ب بنه ئيك ، نابنه دوو
، هه ردئ بن ئيك

، دليڻ سالان داينه ههڤ
، هه ردئ بن ئيك نابنه دوو
، دليڻ من و ته تهڤ برينن
، ژبو ئيكودو نه و ده رمانين ، خوڤاگر به و
، ب مه زنايى و خوڤايى نابت عه شق



73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوقار ب موله ته و فهرمی (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye



دۆژمان دزین

دۆژمان دزین سهروههت و سامان
دگهل دا هه می کهلتورۆ زمان
زانست وزانین هه رناقداریت وان
رهنج وخهبات و دیرۆک وداستان

چه ند زاناییت وان بناقی ئایینی
به رزه کرن ب پیلان بنه ژادگۆرینی
بوخو دانه کار وهک گو تار خوینی
خه لکی هان بدهن بو پیکه ژینی

سه رکرده کوشتن بکه رب و کینی
قاره مانیت وان هه ربو سه ربیینی
یان دکرنه سه نگه ربورشتنا خوینی
دگهل دهوړو به راو بوخو سه پیینی

ژهه ژاران ستان دن هه رباج وخه راج
بو تیریت دۆژمن هه ردکرنه ئامانج
ل هه ردو ئالیان خوینا وان هه راج
هه ر ژبووان بوون ناف ودهنگ وتاج

جاران ئه و بخو دبه ران گیانیت هه ق
یانژی چاف سوړی وترساندن وگه ف
یان بکوشتن وچه ند فه رمان و ره ف
هه رجار ژگراری هه ر ئه و دکرنه که ف

هه له ستقان: م. هه ژار سندی



73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة)



وهرزی سووتانی قهقنهسان
هۆمه رنۆریاوی
ئاویه ره کهم،

بالات بۆچ هینده بلنده،
ئهوی رۆحی بلند نه بی،
گری ئاوره کهت نایگاتی؟!
به ژن بلنده کهم، ئاویه ر،
ئهوه ههر ئاشقانی خۆتن،
ده سووتین و ده بنه قهقنهس.

ئیتیر ئهم وهرزه ناو ده نیم:
"وهرزی سووتانی قهقنهسان".
ئهوه نییه

ههر قهقنهسه و بۆ مانه وه،
له سه ر بلندا ییه کانه

ئاور له جهسته بهر ده دا و
له ویشه وه مژده ی سه وزی ژیا نه وه
ده گو یزیته وه بۆ دلان.

به ژن نه خشینه کهم، ئاویه ر،
ده بسره وه روومه ته خۆله می شیه کهت،
ههر به سبه ی که خۆر هه لدی،
له سه ر ههر بسته خاکیکت،
هه زار هه زار سوور گول ده روی.

هه لبه ستقان / م. هۆمه رنۆریاوی





(وهلاتی من)

چه واته ز ته بینم زمان
ببیژم دایکا دلۆقان
یان هه ر چار پارچه یین دلان
ئه ی وهلاتی من کوردستان

ب هه روه کر ئه وان پالا
دلراستیه ک نه ژبو مالا
تینا رۆژی سو هتن ئالا
ئه ی وهلاتی من کوردستان

قه دهنگا چیا یا و شکه فتی
ترپه یا دلی دل که فتی
کیژان ئاواز تی ژ هه لبه ستی
ئه ی وهلاتی من کوردستان

کاروانی ل کاروانی قه ما
رێیا مه که ت ده شتی چما
بی مه لا بووین (روقیه) نه ما
ئه ی وهلاتی من کوردستان

هه لبه ستقان

م. رزگار محمد ئه مین



73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوکار ب موله ته و فهرمی (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye



هه لبه ستشان
م. بیدهنگ دۆله مه ری

به ختی ته مه هو شقانۆ
دهنگ زه لالۆ بلوور قانو
دلی مه تهف کول و ژانو
دهست پاڤیژه سهر بلووری

ههره سهرقان باسک و گرا
دا دهنگ بچیتته ههر دهرا
دهنگی بلوورا ته برا
خوشتتر ژ نای و سهنتووری

لیده بلا په ز ب جه من
بلا ژ ئیک جودا نه بن
ل با ههف بن بهرخ و بز
گوری دکهن لووره لووری

بهس ب کهفه سهر ته نشتی
نه به توو وهک مینا خشتی
چ پیقه نا هیت سهر پشتی
بینه دهر خه نجهر و شووری

بلوورا خو تو هلینه
باژاری یا پی بهه سینه
گوڤه ندا بیړیا بینه
بی کراسه به ژنا نووری

بلا گوڤه ندی بشارین
دلی دوژمنا دهر بین
دا ل واری مه نه مین
دا تیڤگه هن ل مه نزووری





73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوفارب موله ته و فهرمی (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye



دلخوه شييا من....

چ تشت

من دلخوهش ناکه ن

لسه ر ئه قی دنئ

نه سلاقییت بالابه رزی

نه چهیرانوک و چه نه کییت کنئ

نه باخ و بیستان و

نه گول و کولیلک

لوه رزییت بهاران بتنی

نه سامان و سهروهت و

نه ده مییت زه نگی نییا

به رهق گوپی و که تنئ

ئه گهر نه هییت دادی

پشتی نقی سین و گووتنی

ئه گهر نه بیت ئازادی و

هه ما هندهک روژییت من

بکه ته که یف و خنی

دیاره ئه و ژی سلاقی مه ناکه ن

تا کو

هی رشا چوون و مرئی

هنگی ژی

دهستان نا داهیلم و

دی که م به رخوه دانئ

ژ بو وی هه بوون و هاتنی

هه لبه ستقان: م. ئازاد عه بدلسه لام مایی



🌹 🌹 دهردی خه ربیی یی 🌹 🌹

ئهو گولا گهش بوی چرمسی
ژبه ره شه بایی خه ربیی یی ژناق چوی

🌼 🌼 🌼 . 🌼 🌼 🌼

ئهو چ خه ربیی بو رهخ و دور گرتین
وهک دهرویشه کی بی خودان لیكرین

🌼 🌼 🌼 . 🌼 🌼 🌼

نه ره قین و نه چون و نه هیلان ههیه
ژوی باخچی به ههشتی بی تامکری

🌼 🌼 🌼 . 🌼 🌼 🌼

ژوی گهردونی به رفره بی جهکری
ههردیژین و دئیشین کانی چاره

🌼 🌼 🌼 . 🌼 🌼 🌼

ل دهریا دهربازی مرئی کرین
ژروژ ههلاتی بارکرین په نابهرین ملله تان کرین

🌼 🌼 🌼 . 🌼 🌼 🌼

ههردی بیژین ههسه ره تا وهلاتی کرین
دهردی خه ربیی یی ژ وهلاتی کرین

🌼 🌼 🌼 . 🌼 🌼 🌼

ئهو رونا هییا روناخو ئه م سهردا برین
ئهو خه ربییا خه ربییاخو بی هیقی کرین

🌼 🌼 🌼 🌼 🌼 🌼 🌼 🌼 🌼 🌼

ههله ستخان

م. هه رمان باوه رکی



73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

کوفار ب موله ته و فهرمی (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye



وهر دهرمانكه برينا
نوی كهین په یمانا قینئ
بۆ ههق بدهین ژقانا
ئه قینا راست بچینئ

دهرد و کول دئ دهرمان بن
ژ بۆ دلئ من و ته
نه یار تهق دئ ووندابن
سوز و په یمان ژ بۆ ته

بۆ ته بیژم....
ههر ژ بهر ئاورین ته
دل تژی بۆ ژ کینا
دکه م په سنا قینا ته
دا پئ دهر که م برینا

ژقان ناهین بیرا ته
ئه و ژقانیئت مه داین ههق
کئ ئه و شیرهت دایه ته
روژئ بکهت تاری شهق

بهری دلی بشکینئ
چما ته پرسهک نه کر
بوچی ته بنه هینئ
تیرهک بۆ دلی کار کر

هه لبه ستقان
م. شهعبان هه دینه ی

ته دل شکاند و بۆ دوو کهر
چاره نابیت چ جاری
کوم کرن کول و کهسه ر
ئه قین بۆ ئاخ و زاری

ته ژین کر مالا خه ما
حه تا مابم ئه ز دل به ر
بئ شادی و که یف و سه ما
ئیش و کو قان هاتن سه ر





BI HEZARAN

Bi hezaran sal qedîyan
Kurd dinav kulande man
Kes bi êşa wan nizane
Li Dermanê xwe gerîyan

Dîl bûn di hefs û zîndan
Ez li benda biryara wan
Meşa min bo daw û dozê
Ji bîrnakim biryara wan

Elend avêt roj derket
Ronî b'erd û ezman ket
Min kar û barên xwe kir
Fikr û raman tev derket

Ew roj sibehek zela bû
Rojeke xweş biha bû
Meşiyam dilgeş û şabûm
Ji bo dîrokê amade bû

Min dil kirbû wek pola
Dest avêtim heyf û tola
Wek lehengek Angola
Ketim meydan û hola

Dixwazim herim gel wan
Birîna wan bikim derman
Bibim melhem û kewan
Hênik bikim kezeba wan

Dema min di birîna wan
Min mêzekir l'rengê wan
Raman û helwestê wan
Bûm evîndarê rêya wan

Dixwazim şerkim bo wan
Hilînim tola hezar salan
Biçim hewar û gazya wan
Dê rizgar kim welatê wan

Zorî li sermeye her dem
Çûm ba şîr nebîyê adem
Derbasî ba rûstemê zal
Kurd dîl man in herdem

Çûm ba nebî Nûh û Îdrîsa
Derbasî ba Tehya û îsa
Çûm ba Zekerya û Mûsa
Ketim nava dîrokan dîsa

Ma ka Selahedînê eyûbî
Şêx Mehmûdê Berzencî
Çûm ba Mihemedê Qazî
Min dîroka xwe liba wî di

Dîroka min gelek dirêje
Tev bi keder, derd û êşe
Seyda derdê kurda dibêje
Ne serxweşe ne jî sergêje

Ez çûm wî geliyê zîlan
Geryam li nava goristan
Çûm meydana çarçiran
Qêrînam gihaştî ezman

Çûm ba kardox Şerefhan
Got bipirse ji hor û mîtan
Mi xwe berda birca belek
Ez gihome Mîr Bedirxan

Ez çûm nik Ehmedê Xanî
Min gotî dîroka min kanî
Got her ba Şêx Seîdê kal
Zû bipirse ji wî qehremanî

Min ji Şêx Seîd pirs kirî
Dil û cegerê min kul kirî
Got here cem Seyid Riza
Wî şîretek baş li min kirî

Ez çûm ba baba Barzanî
Min got dîroka me kanî
Got here qada baxdayê
Laşê leyla birîna kêranî

Ez hatime nava helepçe
Dilê min bû parçe parçe
Çûmê zîdana Amed tarî
Tev girêbend û kelepçe

Bazdam ser geliyê Agirî
Min pirsî ye ji îhsan nûrî
Daketim çemê qesaba
Ketim nav laşên bê serî

Vegeriyan şarê Bûrsayê
Ez çûm girava îmrîliyê
Li nik serokê xwe Ocalan
Êş û jan j'min tev rijîyayê

Dil dixwaze we bêj im
Ne sax im kerr û gêj im
Xema xwe çewa bêj im
Digerim wek dîn û gêj im

Ez ditirsim û nikar im
Qal û behsa we bik im
Vî barê gelekî giran
Çewa ji ser xwe rak im

Tu xwedawenda rojhilat
Şewqa we daye welat
Wekî volqana li Ararat
Bi navê we roja şadî hat

Min feyz ji Serok hilan
Pê gelek daxuyanî dan
Bû derman ji gelê kurd
Pê rohnî bû Kurdistan

Derd û kulê'm bûn gelek
Rêberê kurdan nabin yek
Rebenim her tîm dibêjim
Xem û keder tev bûn yek.



Helbestvan
M. Mela Bedirxan




73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوکار ب موله ته و فهرمی (المجله رسمیه و مرخصه) kovar Fermî û destûr da ye

Biçin zozana**Ka emê biçin zozana****Bijîn weke bêrîvana****Bixun rûnê van mêşina****J' bihna bîhok û qawana****Li tavgeha û rûbara****Li seyrana û l' bin dara****Ava qeşa ava sara****J' çavê kanî û zinara****Biçinin gul û beybûna****Bimeşin mîna xatûna****Himêzkin bejna xwezayê****Şevê tarî û hîvrana****Biçine sema van qîza****Hevdana tiok û kuwîza****Vexun ava meşk , kiwîza****Nanê sêlê û rûnê hîza****Bixune goştê hilika****Qeymaxê mastê elbika****Daweta xort û keçika****Nîçîra kew û qitika****Bînvedana li mêrgê şil****Rûnên li ser erda bi pil****Selenda vegrin li ser dil****Ez goriyê wan çavê kil****Hoh hoha tew şivana****L' ser lata û l' bin qizwana****Zûrzûra van sehane****Êrîş dikin van hovana****Helbestvan: M. Wehîba Îsa**



73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوفار ب موله ته و فهرمی (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye

Çêliyê dêlegura

Leyla Leyla zana gulşîlana
Li nava baxan û Gulistana
Leyla min Stêra geş li asmana
Bawer neke ji sozên neyara

Dîroka wan reş qirêj gemare
Bo aştiyê neke hewar e
Çek û pêûs rûmeta gelan e
Leyla min xwe dûr ke ji pîlana

Biratî nabe gel hirç û hova
Serxweş dibin bi xwîna mirova
Leyla min bawer neke ji gura
Hê birîna kevnar germ û kul e

Çavê xwîşk û dayikên me şile
Xwîn diherike ji cerg û dile
Leyla min hêvî nek ji bêjiya
Bav Çeqel e dayik dêlegur e

Leyla min li ser beryara xwe be
Wekî navê xwe jîr û zane be
Welat bê te wêran û Kavil e
Wekî bihara bê xeml û gul e

Leyla Leyla zana gulşîlana
Li nava baxan û Gulistana
Leyla min Stêra geş li asmana
Bawer nake ji sozên neyara

Helbestvan

M. Omer Şihabedîn





73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوفار ب موله ته و فهرمی (المجله رسمیه و مرخصه) kovar Fermî û destûr da ye

Pirpirîk
Pirpirîkê vegere
Li ser destê min deyne

Fira teya bi hêdî
Hesta ji xew difirîne

Gul û çîçek û beybûn
Ji te re xwe dihejîne

Were bi virde de were
Di hêlîna dil de deyne

Bawer bike ji bilî te
Kesek di dil de nîne

Lava dikim zû veger
Şahiyê bi dil xîne

Helbestvan

M. Sefaa Osman Abdo





73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوفار ب موله ته و فهرمی (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye

BEJNA ZIRAV

bejna zirav serî bê çav
Hinek jêre dindin Slav
Ew erdekî bejî bê av
Ne dê Heye û neji bav?

Welatê tirka pir zêdeye
Zar û ziçê wî tûneye
Serê mezin ser Gewde
Hêvî ya, hûnê ew bixweye

Na axive, bê zimana
"Ew hiviya pir însana"
Ew li Hespa tim, siware
Bewerke, ewe ê bê çare

Ne piwîste ez nav, bêjim
Çend hevoka, jêr biri jim
Ê dor sehê dev, girêzin
Ew tovê hîn, berêzin!!

Jire dikevin, pir slavê
Havin zivistan liber tavê
Liber çava, her gavê
"Dibin şîyare, na razê"

Min ji, destê wî pir kişan
Pir îşkence, û pir lidan
Qaşo ew pîsporê însan
Ez bawerim ew ê nezan



Helbestvan
M. Mehmet gulspî





73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوفار ب موله ته و فهرمی (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye

DİKOLÎM,

Ezim bi tev êşê bêdeng,
Dikolim vê dîroka reng ,
Difûrî ji nav qal û ceng ,
Wek stiranin dengbêjî yê,

Ne tenê tu ji min rikî ,
Hiç qeder min re nefirkî,
Wek tevgera hec-hecokî,
Her wistandin karê min e

Ev barana xêr û heybet,
Her der fikir şam û şohret,
Rîya min de bûz û kudret,
Ya ecêb, lê dem havîn e,

Feleka xelkê xweşiyê tê,
Ya min ji zilm hesretê tê
Qurt-qurta dilopê mihbetê,
Dûr bû j' hinasa evîn e

Tevzî li min rê û wergeh,
Hevketin derî û dergeh,
Êşandin ev canê guneh,
Qet l' nehat sitar û rehm e

Helbestvan
M. Dilan Maku





73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوقار ب موله ته و فهرمی (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye

KU HEBE DOSTEK JI DIL

Ku hebe dostek ji dil
Pê kê m dibe derd û kul
Yek gotin û şorê wî
Sivik dike bar ser mil

Ku hebe dostekî xas
Derd kulan dike xelas
Bi hêz û pişteka wî
Dil qet nake tasewas

Ku hebe dostekî baş
Barê te namîne paş
Wî bernede bimeşe
Taa tu herî liser naş

Ku hebe dostekî bav
Tu xwe jêre neke xav
Rojên reş û tarrî de
Çêtire ji av û tav

Ku hebe dostekî mêr
Li piştta te wek dîwêr
Baş zanibe j, bîr neke
Çêtire ji zîv û zêr

Ku hebe dostekî rind
Tu pê dibî serbilind
Rojên reş û tarrî de
Bote dibe çira find

Ku tunebe dostê te
Teng dibe qefesa te
Mîna kesê bê xwedî
Kes nagire destê te

Ku dinya te bê dost be
Wê tev kemîn û kosk be
Çiqas bejna te rind be
Wê tazî be bê post be

Helbestvan

M. Hemîd Xanoser





73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوقارب موله ته و فهرمی (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye

EZ ZANIM EVÎN Çîyê...
 Nasya xwe da evînê,
 Vekir devê birînê,
 „Dil hat dengê nalînê”
 Baş zanim evîn çîye.

Evîn çawa kefene,
 Her canî xwe dalîne,
 Ji te, wê bêhn hilîne,
 Zanim evîn pir zore.

Evîn xemla gul-gulîye,
 Wek agira bejnêye,
 Hêsir çevan mêvane,
 Çimkî hub qedexeye.

Her dera tevî teye,
 Nav, ser zar-zimanaye,
 Bi fîzîkî dûrî teye,
 Lê ruhva te şidyaye.

Evîn stêyrka Mecnûne,
 Ew hesreta Leylane,
 Kul-kesera Zînêye,
 Qeyd,zincîra Memêye.

Xilfa destê Bekoye,
 Xîyanetya Têmûre,
 Ew namûsa Zerêye,
 Tol û kîna Seydoye.

Bela serê bendane,
 Him şîrîne, him tehle,
 Carna dibe wek lale,
 Kemîn xweda dinale.

Evîn ava çîyaye,
 Dixulxule zelale,
 Her kes qultek vexwerye,
 Zanim tîbûn neşkestye.

Evîn hidûd, sînore,
 Çîya û banî navbere,
 Çemê şêlû ortêye,
 Zanim guman piraye.

Evîn çawa hikyate,
 Baxça mine bihûşte,
 Têda çêkir şalaşe,
 Bûye qesra min û te.

Evîn hespekî şêye,
 Evîndar ser sîyare,
 Ber wê şiverêye,
 Zanim rêcek dijware.

Evîn kanya zimzime,
 Gele paqij, tiberke,
 Lalişa me Nûrane,
 Kê hilşîne xêr neke.

Evîn Şemsa bi nûre,
 Diteîse wek hûre,
 Keskesora hevt rege,
 Qehremanek qeşenge.

Evîn ça sûrewêlke,
 Cerge li me dax dike,
 Ne hekîm, ne lokmane,
 Tûne kesek melhemke.

Evîn bext û miraze,
 Kilamek xweş awaze,
 Sîmê keman û saze,
 Zanim evîn pir naze.

Evîn ba û bawêşîne,
 Ew xwezaya hêşîne,
 Carna dila dêşîne,
 Ez zanim evîn çîye.

Evîn kenê lêvane,
 Berdewamîya jîyane,
 Eşq, şabûna însêne,
 Zanim evîn pir xweşe.

Helbestvan
M. Seyran celad





73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوقارب موله ته و فهرمی (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye

EZ POŞMANIM

Ez poşmanim bawer bike
Gazinçê min feyde nake
Sal û zeman darbas dibe
Emir li min dijwar dike

Ez poşmanim ne derewe
Min ne tebat ne jî xewe
Ez ne bînim dostên berê
Birîna min qet na kewe

Derbas nabe li vir jîyan
Min gelek dît derdê giran
Winda dibe emir xilas
Kes na îne rastî ziman

Xwezî li wî warî bama
Li wî gundî sed sal bûma
Dem derbasbî emir borî
Çima evqas dikî loma

Diçe emir nav mêh û sal
Dîtina te bûye xeyal
Dost û xwedî li van dera
Ez na bînim wekî heval



Helbestvan
M. Muzaffer Culduz



73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوڤار ب موله ته و فهرمی (المجله رسمیه و مرخصه) kovar Fermî û destûr da ye

Jina kurdim serbilindim
Ez di cengê de çeleng im
Tucar doza xwe naberdim
Heger dil û can biserdim

Tucar serî na tewînîm
Doza dijmin bicî nakim
Ezê mafê xwe bistînîm
Kurdistanê bi xemlînîm

Jinim ez bi nav û dengim
Wekî şêrim wek pilingim
Ji bo gel bişer û cengim
Bi tanq û top û tîfingim

Hemû gel tevde rizgar in
Ji mafê xwe ne bê parin
Tenê em mane bin destan
Di şerde em wefa darin

Tifinga min li milê min
Libejnê cil û pergê min
Daxwaza doza gelê min
Azadî hêvya gelê min



Helbestvan
M. Nezhet Sîdo



73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوڤار ب موله ته و فهرمی (المجله رسمیه و مرخصه) kovar Fermî û destûr da ye

Jar kirim.....

Bila te dilê min ne hişta
 Ji evînê bûba mişta
 Te canê minji min xwesta
 Bila te dilê min ne hişte

Ez çibkim ji vê jînê
 Dîn û har kirim şêrînê
 Ketim ber lehya evînê
 Bila te dilê min ne hişte

Ez bûm mecnûn li ser leylê
 Bûme evdal dikim wey lê
 Dikim na kim nadê meylê
 Bila te dilê min ne hişte

Ez bûm mem Aşiqê te zîn
 Di zîndanê dikim nalîn
 Ez bûm derya eşq û evîn
 Bila te dilê min ne hişte

H.Bavê hozanJar kirim

Bila te dilê min ne hişta
 Ji evînê bûba mişta
 Te canê minji min xwesta
 Bila te dilê min ne hişte

Ez çibkim ji vê jînê
 Dîn û har kirim şêrînê
 Ketim ber lehya evînê
 Bila te dilê min ne hişte

Ez bûm mecnûn li ser leylê
 Bûme evdal dikim wey lê
 Dikim na kim nadê meylê
 Bila te dilê min ne hişte

Ez bûm mem Aşiqê te zîn
 Di zîndanê dikim nalîn
 Ez bûm derya eşq û evîn
 Bila te dilê min ne hişte



Helbestvan: M. Bavê Hozan





МЕЧТА МИН

Xewn û xeyal xeniqîn,
В черном море, твоих глаз,
Serk êdî ne biriqîn,
Ярким блеском, как алмаз.

Ro bi girî çû ava,
В мыслях моих, ты одна,
Nayê bêhna gulava,
Горечь слёз я, пью до дна.

Eşq û rewşa evînê,
Не разделю, я ни с кем,
Ma dikşînî tu kînê?
Может скажешь, но зачем?

Hîvê berda porê reş,
Как похожа на тебя,
Emrê min bû şeveriş,
Не нахожу я себя.

Gul-govende li bejnê,
Ты небесный, мой ангел,
Ketim tora rûkenê,
Гордость, славы нет предел.

Şev bi rengê çevê te,
Тихо шепчет в ушко мне,
Dilîlîne navê te,
Свет мой вернись, ты ко мне.

Helbestvan
M. Siltana Memê





73
10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوفار ب موله ته و فهرمی (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye

LI PAYTEXTA EVÎNÊ

**Pir dikim şêwr û civîn
Porkurê belengazê
Dilêm dike raperîn
Ew qet nikare razê**

**Çav û brûyên bi kil
Ruh ji min dikişîne
Ditevize dest û mil
Hemû laş bi birîne**

**Li paytexta evînê
Eşq û hub diqîrîya
Wek eşqa Mem û Zînê
Tu bê bask difirîya**

**Dida min cot ramûsan
Wê bêbava çavzerî
Diket nav cerg û dilan
Diperpitîm bê serî**

**Mifteya vî dilê min
Venabe li tu kesî
Ji xeynî te, gula min
Nahûnim gulî kezî**

**Dinivîsim hestên xwe
Li ber wan şevên hicran
Dikolim ser sînga xwe
Navê wan kel û bircan**

**Eywana evîndara
Dilerizî ji bo me
Mizgîn dida dildara
Ronî fikir şevê me**

**Ma ne bese, dîlberê
Bi xeyalên şermokî
Belav bikim her derê
Navê te yê dîrokî**

**Ew xeyalên bûkanî
Li ser girê miraza
Dîlana waşoqanî
Em bikin kêf û naza**

**Helbestvan
M. Tahsin Aktaş**





73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوڤار ب موله ته و فهرمی (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye

NAHÊLIM TÛ KES

Tu dîsa mîna xwe li her carê
Ji min xeyîdîy bê îsaf yarê.

Nahêlî fikrên min bi edile,
Hestên dilê min ken bigul, gule.

Sunda Qesemê ne tû qurişe,
Qîmet, dil xedar û dil bi êşe.

Min soz daye te zalimo yarê
Kesî venakim pêşîr, sîng, bere.

Mame ser ewê soza xwe berê,
Bûme dîl, bendê ewê qirarê.

Min rê qutkrye ber hemî kesî,
Tu xema nexwe û qet netirsî.

Nahêlim tû kes çepil dirêşke,
Serê vê sivê gaz, gerden maçke.

Ezê wan bikim axir zemanê,
Wan biqelînim dîn û îmanê.

Helbestvan
M. Hinara Tajdin





73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

kovar Fermî û destûr da ye (المجله رسميه و مرخصه)

Biyani

Di nav bajarek biyanî
Hizrên wenda di civînim
Goşê mirî çikê xanî
Keser û kulan di lorînim

Bi êş û derde dilê min
Lê xweş nabe ev cih û war
Roj bi roj zore jîna min
Xema can û ceger tev xwar

Dil geş nabe bi yek carî
Biyani me li ber çavan
Kelemim ez li vî şarî
Mîna Kelempêrê palan

Ne Zar min tê ne rengê wan
Her xerîbim wek sêwiya
Ne Ax min tê ne Ava wan
Naguncim van bê xwediya

Ez bûme hêvîkî wenda
Ser van riya berze me ez
Ne ev Lav û qîrên cuda
Mefa didin nesaxim ez

Jar û perîşan û evdal
Ber dîwaran koçerim ez
Ciwani çû derdin heval
Nav xeman de mirîme ez

Xerîbiyê va çemandim
Çûk şikandin ev çav tarî
Nava kulan de razandim
Çar kinaran xevk û dirî

Pela hişkî li van erda
Bihar ji dil re xwezîne
Jiyan borî kul û derda
Xweşî ji can re tunîne

Ez kuştîm feleka xayîn
Koçerek bê war û cî me
Dame ber xwe bi bixz û kîn
Felek li min har û dîne



Helbestvan
M. Bavê Azad





73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوفار ب موله ته و فهرمی (المجله رسمیه و مرخصه) kovar Fermî û destûr da ye

Gewrê....

Jiyan dibiriqî li ser zozanên bi mij
Kesk û sor û zer rengê koçera min
Rûkenî û dilovaniya ser rûyê te
Dilê xembar şad fikir awirên te
Ew dêmên te yên gewr û helesorî
Şewqa xwe dida ser dilê betilî
Were Gewrê ax Gewrê dîsa were
Dilê bê te bi axîn û keser e.

Gewrê kon barkir revî çû zozana
Şewqa xwe hişt li deşt û gundana
Ser rêya xwe reşand sosin û beybû
Nêrgiz xwe bi aliyekê badidana
Biharek din, kî li ku kon vedidana
Zozan bilind, dûrî bajar û gundana
Were Gewrê ax Gewrê dîsa were
Dilê bê te bi axîn û keser e.

Helbestvan

M. Amîne Pîrozxan





73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوکار ب موله ته و فهرمی (المجله رسمیه و مرخصه) kovar Fermî û destûr da ye

Birînên Dil

Helbestvan: M. Îdrîs Heyder

Li ser dîdarên birîna
Bi tazî û zêmare dil
Ji ber te bûm wekî dîna
Bi xemgîn û kovan e dil

J'behra hîkmeta xudayî
Îşqa te li dil ripin da yî
Bhare ji nû belik dayî
Bo te rewşen û mest e dil

Mem im di zîndana te da
Şemal î di canê min da
Dî nûrgeha îşqa te da
Derwêş û perîşan e dil

Li dîdara te me canê
Wekî benda li zîndanê
Ez bê halim mefer kanê
Bi sed zax û xencer e dil

Sed nişter û zax te da me
Lêv şeraba li nav cam e
Li meyxana îşqê da me
Me jê vexwar mey xan e dil

Dil xana we naz û mesta
Dema qeyd te kirî desta
Ji fîraqê êşa ,westa
Lew melûl û êxsîre dil

Dil êxsîrê zulf û xalan
Ma li bendê mah û salan
Kezeb bû agirê daran
Bi sed ah û fixan e dil

Ah û fîxan îruke ne
Ma qey kesên wek me hene
Mendehuş û rê berzene
Birîndar û xwîn zihe dil

Dilu bese heta kengî
Dê hu mînî bi vî rengî
Hinav sotin ji bê dengî
Pirr xem e bêhedar e dil





73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوقارب موله ته و فهرمی (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye

BÊRÎYA TE DÎKÎM.....

Hey zalimê dil gawir

*Helbestvan
M. Bişar Baran*

Bi te re tune ye qedr

Dilê te bûye wek kevir

Ka bêje min çi bi te kir

Me ewqas j'hevdû hez kir

Te min hişt û çûyî ji vir

Keçê ne bê wicdanim

Bi evînê baş dizanim

Em wekî Mem û Zînin


Em yek rih û yek canin

Bêrya te dikim bêhalim

Ji xewên şeva bê parim

Ji bo yara xwe bibînim

Bo dîtinê bi hewildanim.





73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوقارب موله ته و فهرمی (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye

GUNDÎ

Gundî ye milletê en zêde jîr
 Ling nadin bin xwe cîvan û pîr
 Bi azanîya dikê şebeqa sibêra
 Kevanî mil didin jor dikin hevîr

Wek mûrîya tev lez dikin
 Pîrek tendûra xwe sazdikeye
 Malxo tewle û gomê paqij dikê
 Bûk dergûşa xwe aş dike

Qibe qiba zar û zerçanê
 Di destê wanda qetek nanê
 Xalif tune ye xwedê dizane
 Berîya tava sibê tev li pêne

Her roj bi şebeqa serê sibêra
 Dibe teqe reqa tevr û bêra
 Li hev terin û tînê dikin kara
 Jin milê xwe didin milê mîra

Gundî pir karker û bixîrete
 Jêra sekan tune ye dixebîte
 Ser û go tim bi xwelî xubare
 Hem dil piçûke hem bi rûnete

Ez ez pîroz dikim hamû gundîya
 Dernaynê ji gotinê bav û dîya
 Kal û pîrê wan bi rû û bi rûmetin
 Şenayî tim heye li ber derîya



Helbestvan
M. Berzan Erzurum





73

10/8/2025


Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوڤار ب موله ته و فهرمی (المجله رسمیه و مرخصه) kovar Fermî û destûr da ye

Jana Giran
Ez nizanim çima
Ew qas xemgîn bûm
Ji nişka ve
Derdekî bê derman
Tune ye di cihana min de
Lê min tu
Nas nedikir wê çaxê
Wek zarokekî di hembêza
Dayika xwe de bûm
Ta ku rojekê ketim
Tora evîna te
Di vî dilî de wê çaxê
Jana giran bû evîna te
Ew ê roj were
Hemû birîn baş bibin
Ew ê roj were
Ewrên reş belav bibin
Jana giran evîna te
Ez xafilê kenê te bûm
Tu ji ber çavan dûr bûyî
Lê ev dil
Tim tim bi te re dinale
Jana giran kenê te bû

Helbestvan
M. Mem Farqînî





73

10/8/2025

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri

مجلة الكاتب الثقافية

گوڤار ب موله ته و فهرمى (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye

****الوطن حلم****

بقلم الشاعرة
أ. كوردستان يوسف

فإذا مرزتم بي، لا تقفوا
إحملوني كزهرة ذبلت على ضفة النهر
وامضوا...
فالرحيل وطني،
وأنا قنديل ينطفئ قبل الفجر.

أيها العابر في حقول الزمن
هل تسمع حفيف أمواجي؟
أتحطم على صخور الغربة كالمحار
وأجعل من الفراق مرجاناً
يتألق في أعماق الذاكرة.

الوطن قنديل من زجاج حزين
يعلقه الليل على شجرة المغيب.
لا أملك إلا انكسار الضوء
وكل ما أبنيه يتحوّل إلى رماد النجوم.

